Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1131 3-Çile- 2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

Sepana Dîzaynê Ya Canva Kurdîya Kur-mancî li nav zimanan zêde kir

Platforma Canva ku sepana sêwirana grafîkê ya serhêl a belaş e ku ji bo sêwirana postên medyaya civakî, pêşkêşî, poster, vîdyo, logo û hê gelek tiştên din, bi zêdekirina kurdîya kurmancî li zimanê xwe yê sepanê dest bi xizmetên bi kurdî kir.
Bername bi nêzîkî sed zimanan xizmetê pêşkêş dike û êdî hûn dikarin bi rehetî dîzaynên xwe bi kurdîya kurmancî amade bikin. Gelek bikarhênerên kurd ên ku sêwiranên xwe li ser Canva amade dikin, kêfxweş in ku Canva kurdî li zimanê sepanê zêde kiriye û xizmetê pêşkêş dike. Bikarhêneran kêfxweşiya xwe anîn ziman û xwestin sepanên dîzaynê yên din jî bi Kurdî xizmetê bidin, wek Canva.

Çawa Zimanê Serlêdanê Kurmancî Kurdî bikin

Ji rûpela malê, biçin mîhengên Hesabê.
Li ser tabloya Hesabê We, bişkoka (menuya daketî) ya di binê Ziman de bikirtînin.
Di nav zimanan de Kurdî bibînin û Kurdî hilbijêrin.

Pira Nehrî her bedew e

Pira Nehrî ya li Şemzînanê yek ji bedewiyên xwezayî yên Kurdistanê ye. Her demsalê bedewiyeke xwe ya cuda heye. Navçeya Şemzînanê ya Colemêrgê ku dîroka xwe bi hezaran salî ye, malovanî ji gelek şaristaniyan re kir. Gelek berhemên xwe yên dîrokî jî hene. Yek ji van jî pira ji kevir a dîrokî pira Nehrî ye. Pira ji kevir a Nehrî li ser Çemê Şemzînanê ye û bi 13 kîlometreyî dûrî navenda navçeyê ye.
Pir di sala 1898'an de ji aliyê Şêx Mûhammed Siddik kurê Şêx Ûbeydûllah Nehrî ve hate çêkirin. Li nava çiyayên bilind, li geliyekî kûr hatiye çêkirin. Herdu lingên pirê xwe dispêrin tehtan. Pir bi 11 metreyan bilind, bi 21 metreyan jî dirêj e.
Her demsalê bedewiyeke xwe ya cuda ya pirê heye. Her salê bi dehan kes serdana pira Nehrî dikin. Yek ji wan jî Mahmût Temel e ku di demsalên cuda de tê Şemzînanê û wêneyên pira Nehrî dikişîne. Temel diyar dike ku divê bedewiya xwezayî û dîrokî ya vê pirê bê parastin.

Ji bo qablêyetên we derkevin holê divê hûn çi bikin?

Pêşkeftina şiyanan ji mirovan re dibe alîkar ku potansiyela xwe zêde bikin. Mirov dikare rêbazên cûrbecûr bikar bînin ku jêhatîbûna xwe baştir bikin:
1. Perwerde û hînbûn: Perwerde û hînbûn ji bo pêşdebirina jêhatiyan girîng e. Girtina dersan, beşdarbûna qursan, beşdarbûna semîneran, an karanîna çavkaniyên serhêl hemî awayên mezin in ku hûn jêhatîyên xwe berfireh bikin.
2. Pratîzekirin: Ji bo pêşdebirina jêhatîbûnê pêdivî ye ku bi rêkûpêk û domdar were pratîk kirin. Ji bo ku bibe jêhatî hewildanek dubare hewce dike.
3. Ji xwe pirskirin û bersivdan: Bi awayekî objektîf nirxandina xwe û wergirtina bertekan dikare ji we re bibe alîkar ku hûn hêz û qelsiyan nas bikin û pêşde bibin.
4. Nûbûn û afirînerî: Hûn dikarin nêzîkbûn û rêbazên cûda biceribînin da ku jêhatîyên xwe pêşve bibin û ramana afirîner teşwîq bikin.
5. Danasîna armancên dijwar: Sazkirina armancên dijwar dikare ji we re bibe alîkar ku hûn motîve bimînin û şiyanên xwe ji sînorên xwe derxînin.
6. Sebir û domdarî: Ji bo pêşdebirina şarezayan dem lazim e, ji ber vê yekê girîng e ku meriv bi sebir be û hewl bide.
Naskirina xwe, naskirina berjewendî û hêza xwe dê ji we re bibe alîkar ku hûn bi awayê çêtirîn şiyanên xwe pêşve bibin. Bînin bîra xwe, her kes xwedan jêhatîbûn û pêvajoyên cûda ye, ji ber vê yekê girîng e ku meriv nêzîkatiyek rast û erênî ji xwe re bigire.

Sudoku: Bersiv 42

2	4	8	9	7	1	5	6	3
3	6	1	8	5	4	2	7	9
9	7	5	6	3	2	1	4	8
7	1	4	2	9	5	3	8	6
5	3	9	7	8	6	4	1	2
8	2	6	4	1	3	9	5	7
6	8	3	1	4	9	7	2	5
4	9	2	5	6	7	8	3	1
1	5	7	3	2	8	6	9	4

Sudoku:Pirs 43

			4	6		8		2
							6	3
	1	7		3				
1				2	9		8	
3		9		1		4		5
	6		3	4				1
				8		6	2	
2	8							
5		3		7	2			

FERHENGA BIWÊJAN

Riya xwe li cem bigire:
- Xwe bispêriyê; pişta xwe bidiyê; cihê xwe li cem bigire.
Serê wî bilind e:
- Ji xwe bawer e; pêwîstiya wî bi ti kesî nîne; tişteke şermê nekiriye.
Ti kes nikare lingê xwe li lingê wî bixe:
- Ti kes nikare pêşbaziyê pê re bike.
Yê roja teng e:
- Mirov dikare pişta xwe bidiyê; yê baweriyê ye; bi kêrî karên girîng tê; jîr e; jêhatî ye; kar pê dibin.

LI SER BÊBAWERIYÊ

Aqilê min jê nabire:
- Ez bawer nakim bikare bike; ez bawer nakim bi kêr were.
Aqilê min jê negirt:
- Baweriya min pê nehat; bi serê min neket; min bawer nekir ku bikare wî karî bike.
Baran ji ewrê reş tê:
- Hêvî jê nayê kirin; ne li gorî wî karî ye; ew û ew kar ne bi ser hev ve ne.
Bêhêlîn e:
- Li her derê gotineke cuda dibêje; gotinên wî hev nagirin.
Bi benê xelkê xwe bernede bîrê:
- Karê xwe bi destê xwe bike; bi hêviya ti kesî kar neke.
Bi çavê min neket:
- Baweriya min pê nayê.
Biçe bi kumê xwe bişêwire:
- Ez ji te bawer nakim.
(Dema yek tiştekî dibêje, lê yê din jê bawer neke hingê jê re dibêje)
Biçe ji pîrika min re bêje:
- Ez ji gotinên te bawer nakim; tu nikarî bi wan gotinên xwe bi serê min bêxî; tu nikarî min bixapînî.
Biçe ji şekala min re bêje:
- Bi heman wateyê.
Bi wê qûşê tu nagihî Mûşê:
- Bi wî awayî tu nikarî bi ser bikevî; te xwe baş amade nekiriye.
Bi vî hisî tu nagihî ti par û pisî:
- Bi heman wateyê.
Bi Xwedê sond dixwe:
- Bawerî pê nayê kirin.
Çavê min jê negirt:
- Min bawer nekir.
- Min neeciband; min baş nedît; keyfa min jê re nehat.
Çavê min jê ne bawer e:
- Bi heman wateyê.
Çep û rast lê dixe:
- Bawerî pê nayê; kengê çi bike ne diyar e.
Çeqvirîq lê dixe:
- Bi heman wateyê.
Derewan dike çawa ku dendikan biçirizîne:
- Bawerî pê nayê kirin.
Dilreş e/dilê wî reş e:
- Dilxirab e; xirab difikire.
Eger zikê te ne bi hîle ye, zikê xwe bi kevir ve dayne:
- Eger tu durist bî, tuyê bi awayekî din bikî; baweriya min bi te nayê; tu dixwazî min bixapînî.
Erûr bû kefîlê Zerzûr:
- Bawerî bi wî nayê ew diçe yekî ji xwe xirabtir tîne.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

'Hevpeymana Civakî îrade û nêrînên gel îfade dike'

Hevpeymana Civakî ku ji 134 madeyan pêk tê, di 12'ê Berfanbara 2023'an de ji aliyê Rêveberiya Xweser a Herêma bakur û rojhilatê Sûriyê ve hat erêkirin. Endamê Meclisa Giştî ya PYD'ê Mihemed Emîn Elîko diyar kir armanca Hevpeymana Civakî rêxistinkirina civakê ye.**R-5**

Çarçoveya têgînî... Ziman û Şaristanî

Têgîna ziman têkiliya xwe xurt bi têgîna çandê re heye. Di çarçoveyeke teng de ziman bi awayekî bingehîn têgîna sereke ya qada çandê ye. Di çarçoveyeke teng de mirov dikare ziman weke çandê jî bide naskirin. Ziman daneheva civakî ya zêhniyet, exlaq, his û fikra estetîk e ku civakekê bi dest xistiye.**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1131 3-Çile- 2024 www.ronahi.net/ku/

CÎHAN TEV AZADIYA FÎZÎKÎ YA RÊBER APO DIXWAZE

Ji tevgera Gemeîrsam Kampfenê Rûa Fîtko, diyar kir ku paradîgmaya Abdullah Ocalan îlhamê dide wan û got ku " Abdullah Ocalan, jin di serî de ji bo hemû beşên civakî ji bo pirsgirêkên ku em dijîn, rêyeke xelasiyê nîşan dide."

Divê em têkiliyên di navbera xwe de xurt bikin û bi hev re têbikoşin." Ji ber vê yekê mirov çiqasî Abdullah Ocalan fêm bike, ewqasî hembêz dike û azadiya wî dixwaze.

Divê ev pêngav heta ku encam bistîne hîn zêdetir were hembêzkirin û berfirehtir bibe." Heta ku Abdullah Ocalan azad nebe, civakên mexdûrên pergala ku em tê de dijîn nikarin azad bibin."**R-3**

'Bi hêz û berxwedaniya gel wê tevahiya êrişan têk biçin'

Kordînasiyona Kongira Star Şîraz Hemo diyar kir ku armanca êrişên dewleta Tirk a dagirker ên di 23'yê Berfenbarê de dest pê kir û di encamê de binesaziya herêmê û sivîl hatin hedef girtin, têkbirina destkeftiyên gel e û wiha got: "Pêwîste em li hemberî vê qirkirinê xwedî sekn bin û bi berxwedanê jiyan bikin.**R-2**

Desteya Şaredariyê: Tevî kêmderfetan jî xebatekî serkeftî hat meşandin

Desteya Şaredariyan ya Kantona Efrîn û Şehbayê di avakirina binasaziya herêmê de rol û misyoneke girîng wergirtiye ser milên xwe. Di nirxandina xebatê salekê de diyar kirin ku wan bi îmkan û derfetên kêm xebateke serkeftî dan meşandin.**R-6**

Wêjeya şoreşê...(2)

Edebiyat him nivîskar û wêjevanên dunyayê digihîne hev, him jî civak û neteweya wan. Piştdayîn û ragihandina wêjevnên gerdûnî dikarin aştî, azadî û hevaltiya gelan xurt bikin. Wêjevan bi feraset û hişmendiyê ve girêdayî ye.**R-7**

Mirina Sozdar siyasî ye û dewletên dagirker berpirsyar in — Nehîr pale — R-2
Revandina silêman razîkirina dewleta tirk e — Dilyar Cizîrî — R-4
Bîranînek Sêvê Demîr — Farûk Sakik — R-5
Gelo pêwîst e yekîtiyên rewşenbîr û nivîskaran bibin yek..? — Kemal Necim — R-7

‘Em ê civakeke axlaqî vejîn bikin’

Meclîsa Jin a Kongra Îslama Demokratîk di 22`ê Berfanbarê de yekemî konfransa xwe li dar xistibû, Rêveber û endamên Meclîsa Jin a Kongra Îslama Demokratîk diyar kirin ku îslama demokratîk li ser bingeha wekheviyê maf û rola jinan paraştiye.

Ronaz Silêman/Qamişlo

Di 22`ê Berfanbarê de Meclîsa Jin a Kongra Îslama Demokratîk Yekemîn konfiransa xwe bi dirûşmeya “Bi hêza bawerî û ramana Îslama demokratîk em ê civaka exlaqî û polîtîk vejîn bikin” li bajarê Qamişlo li dar xistibû. Di derbarê Konfiransa Meclîsa Jin a Kongra Îslama Demokratîk endama Hemahengiya Jin di Kongra Îslama Demokratîk Emîra Elizo û rêvebera Saziya Olî ya Şêxmeqsûd Nisrîn Ibrahîm ji rojnameya me re axivîn. Emîra Elizo diyar kir ku pêwîstiya jinên îslama demokratîk bi konfransê hebû û wiha got: “Me xwest Îslamê di riya îslama demokratîk de pêk bînin ya ku dûrî îsalama radîkale, herwiha rola jin di nava îslamê de bidin xuyakirin. Ji ber cih û mafê jin di nava îslamê de heye. Me xwest ku hişemndiya bi 100’ê salan hatiye belavkirin ya ku dibêje divê jin bindiset û di malê debe, biguherînin, ji ber bi vî rengî dixwestin rol û mafê jinan tune bikin. Lê jin ne tenê di nava îslamê de, di hemû aliyên civakî de, bi hêz û bawerî xwe da isbatkirin, bi taybet di nava ol de.”

Emîra Elizo

Nisrîn Ibrahîm

‘Îslam bingeh û girîngî daye jinan’

Emîra Elizo di berdewamiya axaftina xwe de da xuyakirin ku di nava civakê de jin her dem xwe ayidê mêr didît û wiha got: “Armanca kar û xebatên me jî ew e ku ji jinên hemû olan re xebatê bikin. Pirsgirêkên ku em rastî wê tên jî em çareser dikin û hîn hin pirsgirêk hene, bi demê re wê bên çareserkirin. Îslama di hemû aliyan de girîng daye jinan, Îslam jin bê maf nekiriye li gorî ku çeteyên DAIŞ`ê û kesên bi navê îslamê axivîn, îslam bingeh û hêz daye jinan mînak jî Sûret Meryem û Nîsai di Qûranê de hatiye ev yek girîngiya jinê di nava îslamê de dide eşkerekirin.”

‘Rêber Apo girîngî û piştgirî da azadiya jinê’

Endama Hemahengiya Jin di Kongra Îslama Demokratîk Emîra Elizo di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku îslama demokratîk hemû olan di nava xwe de digire û got: “Jinên Îslama Demokratîk hemû olan di bin sîwana xwe de digire û girîngiyê didin wan. Em li dijî Îslama radîkalin ya ku tu dînên din di nav xwe de nagirin. Armanca sereke ji Îslama Demokrtatîk belavkirina wekheviyê di nava hemû olan de ye. Bangewaziya min ji hemû jinan re ku têkoşîn bikin ji bo azadiya xwe, herwiha ev berxwedaniya ku em gihştinê bi saya Rêber Apo bo, ji ber Rêber Apo girîngî û piştgirî da azadiya jinê û bi vê piştgiriyê jin karîbû îro roj xwe heyanî astekê ji bindestî û hişmendiya olên radîkal rêzgar bike.”

‘Em ê berxwedana jin di hemû qadên jiyanî de bidin pêş’

Di heman çarcoveyê de Rêvebera Saziya Olî ya Şêxmeqsûd Nisrîn Ibrahîm diyar kir ku armanca wan birêxistinkirina hemû jinan e û wiha got: “Tevlîbûna me ji Konferansê yekemîn ya Meclisa Jin a Kongra Îslama Demokratîk ew e ku hemû jinan birêxistin bikin, herwiha mefhûmê Îslama Demokratîk bidin naskirin, da ku şideta li ser jinan bê rawestandin. Dema çeteyên DAIŞ`ê derbasî herêmên me bûn, xwestin zorê li ser jinan bikin, ji bo wê me xwest em bi kombona hemû jinên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di Îsalama Demokratîk de berxwedana jin di hemû qadên jiyanî de bidin pêş. Jin azad bibin wê civakên azad bên avakirin. Astengiyên li pêşiya me derdikeve hizira civakê ye, dema dibêje jinê olî çawa kar û xebatê ji derveyî malbata xwe dike, ji bo wê di riya konferansê de me ji civakê re diyar kir ku em kar û xebatên exlaqî ji bo azadiya civak û jinê didin meşandin.”

Pilansaziya Meclîsa Jin a Kongra Îslama Demokratîk

- Ji bo damezrandina akademiyek taybet a ji bo Encûmena Jinan di Kongra Îslama Demokratîk de kar û xebat bên kirin.
- Bihêzkirina ragihandina encûmanê bi amadekirina plansaziyeke medyayî ya herdemî ku tê de bernameyên pirsgirêkên jinan di ol û civakî de were nirxandin.
- Ji bo berfirehkirina peywendiyan li ser asta herêmî û cîhanî di warê danûstandina serdan û lidarxistina semîneran bi riya platformên medyaya civakî Kar û xebat bên kirin.
- Li ser amadekirina ku rsên perwerdehiyê xebat bê kirin.
- Berdewamkirina lêkolînên taybet li ser axaftinên lawaz û çêkirî yên di derbarê jinan de û komkirina wan di pirtûkek taybet de.
- Birêxistinkirina xebatên Meclîsa Jinan li herêmên ku hîn nehatine birêxistinkirin û li gorî pêwistiyê zêdekirina endaman.
- Ji bo bilindkirina rola jinan di Komîteya nêrîn û îctîhadê de di çerçoveya Kongraya Îslama Demokratîk de kar û xebat bên kirin.

‘Bi hêz û berxwedaniya gel wê tevahiya êrişan têk biçin’

Birûc Resûl/Qamişlo

Kordînasiyona Kongira Star Şîraz Hemo diyar kir ku armanca êrişên dewleta tirk a dagirker ên di 23’yê Berfenbarê de dest pê kir û di encamê de binesaziya herêmê û sivîl hatin hedef girtin, têkbirina destkeftiyên gel e û wiha got: “Pêwîste em li hemberî vê qirkirinê xwedî sekn bin û bi berxwedanê jiyan bikin, herwiha em di wê baweriyê de ne ku serkeftin para me ye.”

Dewleta Tirk a dagirker wekî dewama êrişên qirkirinê di 4’ê Cotmehê de êrişî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir û di encamê de binesaziya herêmê hat hedef girtin. Careke din di 23’yê Berfenbarê de êrişên xwe dest pê kir û binesaziya herêmê ji petrol, kehrebe, fabrîkayên nîsk, pembû, zeytûn, çapxane, nexweşxane, rêbend û gelek cihên xizmetguzariyê bombebaran kir. Herwiha di encama êrişên dagirkeriyê de gelek welatî şehîd û birîndar bûn.

Derbarê êrişan û armancgirtina binesaziya herêmê, herwiha berxwedana gel ya li hemberî êrişan kordinasiyona Kongra Star Şîraz Hemo ji rojnemeya me re axivî.

Şîraz Hemo diyar kir ku armanca êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser herêma bakur û rojhilatê Suriyê têkbirina projeya demokratîk ya ku bi peşengiya gelê kurd dest pê kir û wiha domand: “Dewleta Tirk a dagirker ev zihniyeta qirêj bi dehên salan berdewam dike, her wiha gelê xwe li ser nejadperestî ava kiriye. Ev zihniyeta qirêj a dewleta Tirk a dagirker ji destpêka sala 1923’an di nav peymana sîver de dest pê kiriye. Di heman demê de sedema yekem ew e xewna osmaniyan pêk bîne û dixwazin çanda bav û kalkên xwe ya xwînmij belav bikin. Sedema duyem jî dagirkeriya Tirk xwedî sîstemek desthiladarî û qewmî di herêmê de ye û naxwaze sîstema Rêveberiya Xweser a Demokrtîk di nav gelên herêmê de pêş bikeve, ji ber vê yekê êrişên pir mezin dide meşandin. Her ku destkeftiyên gel zêde dibin êrişên dagirkeriya Tirk zêde dibin. Piştî ragihandina Hevpeymana Civakî û li darxistina Kongira MSD`ê dewleta Tirk a dagirker êrişên xwe yên hovane zêdetir kir.”

‘Em ê li hemberî vê qirkirinê xwedî sekn bin’

Şîraz wiha di berdewamiya axaftina got: “Dewlata Tirk a dagirker destkeftiyên civakê dike hedef, dizane ku ev destkeftî ne tenê yên civakê ne, herwiha ev destkeftî yên Rojhilata Navîn tevahiye. Ji ber vê yekê dewleta Tirk a dagirker dixwaze bi hemû cureyên êrişên xwe gelê kurd qir bike û benesaziyên civakê ku pêdiviyên civakê peyda dike hedef digire da ku gel koşber bibe. Binesaziyên ku hatine hedefgirtin hemû cihê genim, prtrol, nexweşxane, çapxane, derzîxane û gelek sivîl hatin hedef girtin. Sekna gelê me di êrişa 4’ê Cotmehê de û heya niha jî bê rawestandin berdewam dike. Li kêleka êrişan pêngavek ji bo azadiya fizîkî ya Rêber Apo dest pê kiribû, gelê me ji bo azadiya Rêber Apo û li dijî êrişan xwedî seknek pir mezin e. Dewleta tirk biryara qirkirin, tunekirin û ji bo sîstema me neyê rûniştandin, êrişî îradeya civakê dike. Divê gelê me ji vê xurtir û bi hêztir bin. Çalakiyên gelê me cihê pîrozî ye û em li pey şervanên xwe ne. Pêwîste em jî wek gel li hemberî vê qirkirinê xwedî sekn bin. Hedefa dewleta tirk ji bo qirkirina gelê Kurd û qelskirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê ye lewma divê gelê me asta têkoşînê xurtir bikin da ku em tevahiya êrişan têk bibin.”

‘Divê rêxistinên navneteweyî li hemberî êrişan bêdeng nemînin’

Kordinasiyona Kongira Star Şîraz Hemo di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku bêdengiya hêzên navnetewî tê wateya ku çireya kesk dane dewleta tirk a dagirker û wiha got: “Dema em dibêjin berxwedan jiyane rastî jiyana ji ber ku em nikarin bê berxwedanî jiyan bikin û em di vê baweriyê de ne ku em ê bi ser bikevin. Her wiha wekî jin em ê berxwedana xwe li hemberî dijmin mezin bikin. Bangewaziya me ji hemû rêxistinên navnetewî heya ku bi erkê xwe yên exlaqî rabin û bêdeng nemînin”

Ji Pênûsa Jin

Mirina Sozdar siyasî ye û dewletên dagirker berpirsyar in

Nehîr Pale

Qirkirina çandî û fêzîkî sala 2018`an li dijî gelê Efrînê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hat destpê kirin. Malbatên ku li bajar û gundên Efrînê mane çarenûsa wan ketiye destê dewleta Tirk û çeteyên wê de. Rêbazên herî zêde ku vê civakê ji aliyê madî û manewî ve qir bike, didin bikar anîn. Destê datînin ser mal û mulkên wan, darên zeytûnan ku ji bo gelê Efrînê pîrozin ji kokê radikin, hemû şûnwarên Efrînê ku nûnertiya hemû çandên Rojhilata Navîn dikin, dizin û firotin. Tirkiyê û çeteyên wê hewl didin ku erdnîgariya Efrîn a pîroz ku nûnertiya hemû gelan dike, veguherînin çoleke ziwa û mirî. Malbatên Efrînê kirêtiya çeteyan û dewleta Tirk qebûl nakin û dema dixwazin li ser xaka xwe bimînin rastî politîkayên gelekî qirêj tên, êdî ne tenê politîka imha û înkarê li ser wan didin meşandin, bi darê zorê berê wan didin koçberiyê. Civakî û exlaqî buyerên ku civakê aliyê ruhî û fêzîkî ve hêdî-hêdî bukjê diqewim in. Komî tecawizkirina jinan, revandin û kuştina wan, avêtina cenazeyên jin li ber rêkan, mirovên ixtiyar işkence kirin û ew di bin işkencê de kuştin, ev hemû buyer ji berê zêdetir bûne û civaka Efrînê ya hatiye dagirkirin roj bi roj tê qir kirin.

Hejmarek ji malbatên Efrînê ev bûye 6 sal li herêma Şehba li kampa Serdem, Berxwedan û Veger dimîn in. Civakî, siyasî, aborî û ji hemû aliyan ve li ber xwe didin. Bi riya çalakiyên siyasî her tim têdikoşin ku herêma Efrînê ji dagirkirina Tirkiyê û çeteyên wê rizgar bibe û vegerin ser xaka xwe. Malbatên Efrînê yên li Efrînê dimînin her tim di encama polîtîkayên Tirkiyê de rûbirûyî qirkirinê tên, li herêma Şehba jî ji ber dorpêça hikûmeta Şamê ya siyasî û leşkerî zextekî aborî yê mezin li wan tê kirin. Li herêma Şehba ji derveyî Rêveberiya Xweser tu rêxistînên navnetewî bi gelê Efrînê re nabe alîkar, ji xwe hikûmeta Şamê ji bo zextê li ser Rêveberiya Xweser bike Şehba û Şêx Meqsûd her tim dorpêç dike. Hikûmeta Şamê destûr nade ku alîkarî derbasî Şêx Meqsûd û Şehba bibe. Gel jî li hemberî dorpêçê têdikoşe û hewl didin ku serma, şert û mercên demsala Zivistanê bandorî li ser wan nekin. Mirovên temen mezin dibe ku sermayê tehemul bikin lê ixtiyar û zarok tehemul nakin û jiyana xwe ji destê didin. Herî dawî zaroka 3`ê salî Sozdar Hesen ji ber sermayê nexweş dikeve. Ew ji gundê Tirindê yê Efrînê ye û malbata wê li kampa Serdemê dimîne. Malbata Sozdar gelekî hewl didin ku tedawiya wê bikin lê canê Sozdar nexweşiyê tehemul nake û jiyana xwe ji destê didin. Malbata Sozdar û civaka wê wefata wê qebûl nakin; ji ber ew di encama sermayê de miriye, ango mirina wê siyasî ye. Mirina siyasî ji exlaq û qanûnê dur e, tu civak nikare wê yekê qebûl bike, ji ber wê roja 1`ê Kanûnê 2023`an wê her tim ji malbat û civaka Sozdar Hesen re rojeke bi lanet be.

‘Helbest û pênûsa min rêhevalên şevên tarî ne’

Helbestvanê ciwan û xwendekarê Zanîngeha Rojava Dilyar Hebîb ku ji bajarê Amûdê ye bi riya pênûsa xwe heştên xwe tîne ziman. Hebîb diyar kir ku ew pir ji helbestê hez dike û got, heşt û derbirînên min, helbeşt û pênûsa min dike mêvanê şevên tarî.

Hemza Sêvo/ Qamişlo

Huner û afrînerî herdu qad, temenê mirov nas nakin, dibe xwe li ser dil, mejî û hestên ciwanekî an zarokekî an jî kalekî bide û xwe berde nav kûrahiya jiyana wî. Hunera helbestê jî mîna hunerên din e ku dibe zarokek an gêncek û hwd… hestê xwe bîne ziman û bi xeyalên xwe helbestan bihûnîne. Mînakên wiha di roja îro de li Rojava pir in, yek ji wan jî helbestvanê ciwan jî Dilyar Hebîb. Hebîb li gundê Tilxenzîr yê girêdayî navçeya Amûdê ji dayik bûye û temenê wî 24 sal e.

Dilyar heta qonaxa xwendinê ya amadeyî li dibistanên Amûdê xwendiye û di sala 2019’an de bawernameya Bekeloriyaya wêjeyî ya hikumeta Şamê werdigre û berê xwe dide perwerdeya bi zimanê kurdî. Dilyar Hebîb ji ber xwestek û vîna xwe, li Zanîngeha Rojava dest bi xwendina Beşa Wêjeya Kurdî dike. Ew di nav hevalên xwe de yek ji xwendekarên serkeftî ye, ji ber vê yekê jî karîbû mijûlî hunera nivîsîna helbestê bibe û dest bi nivîsîna helbestê bike.

Ji wê demê ve heta roja îro, êdî xwendina xwe ya zanîngehê didomîne û hem jî helbestan divîsîne, herwiha di Nefefel Productionê de kar dike.

Dilyar di gelek festîval, evbuhêrkên wêjeyî, çalakiyên hunerî û çandî û hwd… de helbestên xwe xwendine û herî dawî jî 9’emîn festîvala Rojava ya Çand û Hunerê ya HRRK’ê bû.

Herwiha helbestvanê ciwan, Dilyar Hebîb têkildarî nivîsîna helbestê û beşdarbûna xwe di festîvala Rojava ya Çand û Hunerê de, ji rojnameya me re axivî.

Helbest li cem Dilyar

Helbestvan Dilyar Hebîb di derbarê nivîsîna helbsê de wiha got: “ Helbest ji min re rêhevala şevên tarî ye. Di zarokatya min de xeyal û ramana nivîsîna helbestê bala min nedikşan. Lê di destpêka ku ez derbasî Beşa Wêjeya Kurdî di Zanîngeha Rojava bûm, êdî min xwest hestên xwe bînim ser ziman. Ew gav di warê nivîsîna helbestê de weke yekem gav bû û min ji wê demê ve ji helbestê hez kir û hîna jî jê hez dikim. Herwiha min li ser dayikê, şehîdan, evînê, hezkirina welat û hwd… helbest nivîsandine. Cara yekem min helbestek li navê Îşev nivîsand û min di gelek çalakiyên hunerî û çandî de dixwend. Heval û malbata min û gelek kesên din ji vê helbestê hez kirin. Malbatê jî moralê min ji bo nivîsîna helbestê bilind kirin û ez jî bi hezkirineke mezin nêzîkê pênûsê bûm. ”

Festîvala Rojava ya Çand û Hunerê ji bo Dilyar derfeteke mezin bû

Hebîb têkildarî tevlîbûna xwe di festîvala Rojava ya Çand û Hunerê de û sûdmendiya wê wiha anî ser ziman: “Îsal HRRK’ 9’emîn festîvala Rojava ya Çand û Hunerê li dar xist û gelek nivîskar, rewşenbîr û hwd… bi coşeke mezin tevlî bûn. Birastî çalakiyên wiha derfet dide helbestvan, rewşenbîr û nivîskaran ku li hev bicivin û bi cesaret derbirînên xwe bînin ser ziman. Festîvala HRRK’ê jî piştgiyrê dide me ku em hest û xeyalên xwe vebêjin, di heman demê de asta rewşenbîrî û wêjeyî pêş dixe. Ez jî îsal tevlî vê festîvalê bûm, min helbesta bi navê Tu Nehat û Dîsa di roja 9’an a festîvalê de xwendin. Ev bûye cara 3’yan ku di festîvala Rojava ya Çand û Hunerê de beşdar dibim. Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê girîngiyeke gelek mezin dide çalakiyên ji bo geşedana rewşenbîrî, wêjeyî û çandî, ev ked jî cihê sipasiya me helbestvan, rewşenbîr, nivîskar û hwd… .”

Hewldana ji bo çapkirina dîwanekê

Helbestvan Dilyar Hebîb girêdayî helbestên xwe û amadekirina dîwaneke helbestî de got, Min heta niha nêzî 30 helbest nivîsandine û weke ciwankekî kurd min karîbû derbirîn û hestên xwe bikim helbst û bi terzê nûjeniyê bi zimanê kurdî bihûnînim. Niha hewldan hene ku ez van helbestan bixim dîwaneke biçûk a helbestan û wê di siberojê de çap bikim. Ev dîwan jî wê bi navê Dengê Şevê be. Di şevan de kesên hestyar û xwedî xeyalên fereh bi wan hest û xeyalan nêzî pênûsê dibin. Ez jî di şevan de bi raman û arazûyên xwe kûr diçim û helbestan dinvîsînim. Lewma têklî û girêdaneke mezin di navbera min û şevê de heye û hem jî helbesta min a pêşîn jî bi navê şevê ye. Ji ber vê yekê navê herî guncav ji bo min yê vê dîwanê wê Dengê Şevê de be.

Wêjeya şoreşê...(2)

Edebiyat him nivîskar û wêjevanên dunyayê digihîne hev, him jî civak û neteweya wan. Piştdayîn û ragihandina wêjevnên gerdûnî dikarin aştî, azadî û hevaltiya gelan xurt bikin. Wêjevan bi feraset û hişmendiyê ve girêdayî ye. Ew bi qelema xwe dikare civaka xwe û hemû civakên dunyayê ji xirabî û gemara demê haydar bike û ji wan re riya mirovatiyê raber bike.

Mîna hemû beşên hunerê, wêje jî di nav civakê de derdikeve holê û bi civakê re xwe dikemilîne. Di navbera civakê û wêjeyê de her dem têkiliyekî dualî heye. wêjevnên ji nava civakê derdikeve û berhemên xwe mîna konekî li ser sînga civakê divede. Berhemên wêjevnên, ango wêje ruh dide civaka ku tê de dijî, hişê/bîra wê teze û zelal dike, çêdike û derman dike. Ji bona fêmkirin û lihevkirinê zemîn peyda dike, amade û sererast dike. Li gor pêwîstiyên civakê pêşiya wan ronî dike, ji wan re dibe rêber. Herwiha wêje di heman demê de dibe çavkaniya pêşxistina ziman û ji milê çandî ve jî bi xwe re çandeke resen, têr û tijî derdixîne holê.

Dema mirov bala xwe dide berhemên wêjeyî dibîne ku ew ji bona lêkirina bîra/hişê hevpar a gel pêwist e/gereke. Hemû berhemên wêjeyî li gor însan û vegotinên însanan hatine pêşkêşkirin ew her tim zindî dimînin û di hemû dem û çaxan de mirov ji wan sûdê werdigre. Mirov çiqas zimanê xwe pêşbixe bi qasî wê ew pêşdikeve, ji ber ku fêrbûn û pêşxistin ziman li cem mirov di hemû aliyên din de jî pêşketinê dide avakirin. Ji ber ku mirov hebûneke civakî ye û di bin bandora civakê de ye, kêm be jî bi kirinên xwe li ser civakê xwedî bandor e. Gelê kurd bi salane ku zimanê wî hatiye qedexe kirin, kêm hatiye dîtîn û biçûk hat xistin. Lê bi saya wêjeya devkî (dengbêj û çîrokbêjan) parast û bi wan hestên xwe derman kir. Ew hêza gotinên devkî ji birîn, hêrs, bêçaretî û tengasiyên wan re bû derman.

Jiyaneke bê wêje roj bi roj tê de hestên civakê vedimirin û mirov di nava civakê de bê xem û bê hîs dibin, civak jî cewherê xwe dûr dikeve û tarûmar dibe. Wêje rastiya jiyana azad û birûmet ji mirovan re xêz dike û bi rengên herî xweşik û delal dixemilîne û cewherê mirov çiye pê dide naskirin. wêjevan civakê hişyar dike û ji bona tekûziyên mirovahiyê berhemên xweşik û bedew pêşkêş dike. Civak û gel ji gor xwedîderketina wêje û wêjevanan dikare xwe bighîne asteke mezin û bilintir. Ji ber ku tiştên neteweyekê li ser piyan dihêlin wêje û berhemên wê yên wêjeyîmne. Ew jî bi zimanê zexim û dewlemend ê wî gelî ve girêdayî ye. Lewma hemû dewletên dagirkerên nûjen êrîşên xwe yên destpêkê li dijî zimanên gelên bindest dikin. Kurdan bîrên/hişên xwe demeke dirêj bi stran, kilam, çîrok û destanên dengbêjan zindî girtin. Şoreş jî bi xwere guhertin û veguhertinên bingehîn di nava civakê de dide avakirin û şoreş ji bona avakirina civakeke nipûnû çavkaniya hêz, bawerî û azadiyê ye. Ji ber vê Dema gotina şoreşê tê li ser zimên, yekser tê hişê mirov ku wê jinûve jiyan mîna xemla buharê bipişkive û mîna avzêmê, çem û rûbaran bê ku tu qeyd û bendan nasbike bihe-rike. Ango şoreş tabloyeke ku tê de wênexêz hemû rengên xweşik û delal bikartîne û bi vê yekê dixwaze bala herkesî biksîne ser kar û xebatên ku ew dide meşandin û dixwaze berhemên xwe bi rengekî herî baş bighîne gelê xwe.



Herweha ger ku Şoreş ne civakî be, mirov nikare navê şoreşê lê bike, wêje jî ger ji rasteqîna civakê dûr be û nikaribe bibe neynika civakê, wê nebe wêjeya resen û wê nikaribe bibe malê civakê tevahî. Civak bi riya çand, wêje û dîrokê teşeya xwe digre. Ji ber vê yekê şoreş bê edebiyat nabe û ji bona ku xebatên wêjeyê biserbikeve pêwîstî bi şoreşeke edebiyatê heye. Çawe ku pêdiviya civakê bi gelek şoreşan heye ji bona ku xwe bighîne azadiyê û xwe ji qeyd û bendên koletiyê rizgar bike. Di heman demê de pêwîstiya civakê bi şoreşa edebiyatê jî heye. Ji ber ku wêje giyan û hestên civakê zindî dike û di hundirê civakê de vîn, bawerî, coş û zanistiyê pêşdixîne.

Têbînî

Gelo pêwîst e yekîtiyên rewşenbîr û nivîskaran bibin yek..?

Kemal Necim

Bi salan e ku mijara pirbûna sazî û yekîtiyên rewşebîran li Rojavayê Kurdistanê di rojeva rewşenbîr û nivîskaran de ye. Pirsa ku dikeve rojevê jî ew e, çima nivîskar û rewşenbîr di bin banê saziyekê de nayên birêxistinkirin. Di pêvajoya salên derbasbûyî de der barê mijarê de çend hewildan û civîn û gotûbêj hatin lidarxistin lê tenê mane di çarçoveya nirxandin û gotûbêjê de. Dawiya sala derbasbûyî Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK`ê Nehemîn Mihrîcana Rojava ya Çand û Hunerê lidar xist. Di nava bernameya mihrîcanê de hewil hate dayin ku vê mijarê careke din têxin rojevê û dihate payin ku bi beşdariya nûnerên çar saziyên rewşenbîr û nivîskaran panêleke berfereh bête lidarxistin. Mixabin ku di roja dê panêl lê hatiba lidarxistin de dewleta Tirk a dagirker êriş li dijî herêmê û bi taybet bajarê Qamişloyê pêk anîn, HRRK`ê jî neçar ma ku çalakiyên mihrîcanê li cihê ku gihiştibû raweştine. Lê di wê kêliya ku pêwîst bû panêl hatiba lidarxistin de, li ber navenda HRRK`ê dîsa nûnerên her çar yekîtiyên rewşenbîr û nivîskaran kom bûn û li dijî êrîşên dagikeriyê daxuyanî dan û helweşteke hevbeş bi perpirsyarî û welatperwerî nîşan dan. Em vegerin mijara xwe. Di rewşa heyî de li Rojavayê Kurdistanê 4 yekîtiyên rewşenbîr û nivîskaran ên çalak hene, her wiha çend saziyên din hene lê ji ber ku li welêt ne çalak in hebûna wan pir diyar nabe. Lê gelo bi rasît pirbûna van saziyan pirsgirêk û arîşe ye, lê rewşeke asayî û normal e.

Ji ber ku mijara parçebûn û belavbûna siyasî di nava civaka Kurdan û tevgera siyasî ya Kurdî de bûy girêkeke bi êş û derd, doz û daxwaza yekîtiyê bi dehên salan bûye daxwaz û hêviya Kurdan, bi sedan helbeşt û stranên ku doza yekîtiyê dikin hatine riştin, her wiha bi dehan hewldanên yekîtiyê jî hatine pêkanîn. Vê rewşê bandora xwe daye qadên din ên jiyanê jî, lewma çîna rewşenbîrî ya Kurd ji mijara parçebûn û pirbûna saziyên rewşenbîrî dilgiran in. Li gorî vê çînê sedemên vê parçebûnê jî siyasî û birdozî ne û dibînin ku her saziyek girêdayî aliyekî siyasî yan ê bîrdozî ye.

Pir diyar e ku behremendî û afrêneriya ramyarî yan wêjeyî û hunerî tiştên takekesane ne. Ango mirov dibêje filankes behremend û afrêner e, lê mirov nikare bêje filan yekîtiya rewşenbîran afrêner û behremend e. Her wiha alîgiriya siyasî û bîrdozî jî helweşteke takekesane ye, lewra mirov nikare bêje filan yekîtî çepgir e û filan rastgir e, eger wilo bibe ew nabe yekîtiya rewşenbîr û nivîskaran lê dibe rêxistîneke siyasî ya girêdayî aliyekî siyasî.

Pêwîste erk û delametên saziyên rewşebîrî pêşxistin û geşkirina çand û wêje û kelpûr û ramanê be. Her wiha birêvebirina kar û barên kesên ku bi van mijaran mijûl in. Eger ev sazî van erkan pêk tînin û qada afrêneriyê û behremendiyê ferhed dikin, aşta wêje û çandê bilind dikin, wê çaxê endamên van saziyan alîgirên kîjan aliyê siyasî û bîrdozî bin dê ne pirsgirêk be. Her wiha dê diyar bibe ku pirbûna saziyên rewşenbîrî jî ne pirsgirêk û arîşeyeke mezin e, berovajî wê dibe ku bibe egera pêşketin û geşkirina qada çand û wêjeyê.

Desteya Şaredariyê: Tevî kêmderfetan jî xebateke serkeftî hat meşandin

Desteya Şaredariyan ya Kantona Efrîn û Şehbayê di avakirina binasaziya herêmê de rol û misyoneke girîng wergirtiye ser milên xwe. Di nirxandina xebatê salekê de diyar kirin ku wan bi îmkan û derfetên kêm xebateke serkeftî dan meşandin.

Zana Roj/ Şehba

Desteya Şaredariyê li herêma Şehbayê ji destpêka desrbasbûna gelê Efrînê ji herêmê re hat birêxistinkirin. tavahî xebatê wan di nava gel de tê meşandin û pareke wan ya mezin di xurtkirina binasaziya herêmê de heye. Li kêlek êrişên dagirkeriyê yên li ser herêmê û dorpêça Hikumeta Şamê jî, lê kar û xebat heta astekê hat meşandin, ev jî bi alîkariya gel hat pêkanîn.

Xebatên Desteya Şeredariyê ya Kantona Efrîn û Şehbayê yên 2023'an

Desteya Şaredariyê xwe li ser du beşan dide rêxistinkirin, hin aliyê rêxistinî û hin jî piratîk e. Komîteyên wê xwe di hemû navçeyan de birêxistin dikin û xebatê wan li ser wî esasî tê meşandin. Ji ber wê jî di destpêka sale de weke ku Desteya Şaredariyê ji rojnameya me re daye diyar kirin ku pêwîstiya wan bi guhartina hin komîteyan hebû û valatiyên rêxistinî hatin dagirtin.

Perwerde

Ji bo derbaskirina kêmaniyên rêxistinî û meslekî yên sala bûrî, desteya Şaredariyan di sala 2023'an de girîngî dan xebatê perwerdê. Li ser asta gişt̂î şaredariyê komîteya navendî ya

perwerdê heye. Kar û xebatê wan li ser esasê rewşa şeredariyan di milê rêxistinî de şopandin û li gorî pêwîstiya her qadekê xebatê perwerdê meşandin e. Herwiha li ser asta gişt̂î şeredariyê perwerde hatin vekirin, di aliyê perwerdeyên bîrdozî yên gişt̂î de jî 10 endamên şeredariyê cihê xwe tê de girtin. Di heman demê de perwerdeyên meslekî ji bo xebatkaran dihatin meşandin. Bi gişt̂î li gorî bûyer û rûjevên ku tên qewmandin hemû xebatkarên şeredariyê semîneran dibînin.

Xebatên ji bo peydakirina avê ji gel re

Pirojeyên desteya Şaredariya ji bo kolandina bîran hebûn. Li milê navçeya Fafînê 2 bîrên istismarî hatin kolandin, li Babinês yek bîr û li kampa serdemê yek bîr hat kolandin. Ev bîr ji hemû aliyan ve hat amedekirin û bûn menhel. Niha jî di piratîkê de ne.
Li tavahî herêmê pêdiviyên gel di milê avê de bi riya şeredariyê tê pêk anîn. Li ser wê esasê jî 3 sahrîjên avê hatin kirîn. Li gorî Desteya Şeredariyê di gişt̂î sala 2023'an de 7 milyon 99 hezar û 779 bermîlên avê hatine belavkirin. Her wiha nêzî 4 hezar û 946 mitir xetên avê hatiye belav kirin. Di gişt̂î herêmê de 24 menhelên avê hene. Lê ji ber rewşa herêmê û tunebûna sotemeniyê, hinek ji wan menhelan weke rêbazeke çareseriyê li ser enerjiya tavê hatine bikr anîn, herî kêm li her navçeyekê yek menhel bi rêbazê enerjiya tavê tê xebitandin ji bo bicih kirina pêwîstiyên gel.

Xebatên çêkirina riyan

Yek ji plansaziyên desteya şeredariyê çêkirina riyan bû, di hejmara gişt̂î ya çêkirina riyan de nêzî 9 hezar û 104 mitir bi dirêjahî hatiye çêkirin. Ew jî li Til Rifet, Til Qirah, Fafîn, Ehdas, Kefer Garês û Wehşiyê bû. Ev hemû riyên ku hatine çêkirin bi îmkaniyet û derfetên herî kêm li gorî pêwîstiyê hatine amedekirin.

Xebatên elektirîkê

Li gorî desteya Şeredariyê, di gişt̂î Şehabyê de 75 jêdarên elektirîkê (jenetur) hene. Hejmara gişt̂î ya empêrên ku hatine belavkirin 34 hezar û 138 empêrin, ji wan ji sedî 80 bê pere li gel hatiye belavkirin. Herwiha li gorî pêdiviya gel di herêmê de îsal 7 jeneturên elektirîkê hatine kirîn.

Çêkirina parkan û çandina daran

Li ser asta herêmê parkek gişt̂î bi aliyên têkildar re hat amedekirin. Her wiha 2 parkên biçûk li Dêr Cimêl û Til Rifetê hatin çêkirin. Ji derveyî wê bi komîta çandiniyê û meclîsan re amedekariya çandina 800 darî hat kirin

Xebatên şeredariyê di felaketa erdhejê de

Bûyera erdheja ku hatiye rûdan bû sedem ku astengiyên gel di Şehba û derveyî Şehbayê de zêdetir bibin. Piraniya gelên derdor ji ber rûxandina malên wan berê xwe dan herêma Şehbayê. Ji ber wê jî erka herî sereke dikeT ser milê şeredariyan. Di wê demê de desteya şeredariyê berê xwe dan kampan û nêzî binasaziya 300 cadir li kampa Serdem hat amede kirin, her wiha li kampa Berxwedan 20 çadir û li kampa veger 60 çadir hatin amedekirin. Weke gişt̂î nêzî 380 çadirî ji hemû aliyan ve hat amedekirin.

`Bandora dorpêçê li ser xebatê şeredariyê`

Dorpêça Hikumeta Şamê ya ku li ser herêma Şehbayê daye ferizkirin, ji sedî 99 li ser xebatên şeredariyan di asta yekemîn de bandor kir. Yek ji wê jî xebatê paqijiyê di nava gundan de, her wiha saetên kehrebê ji bo gel hatin kêmkirin ji ber tunebûna sotemeniyê. Di aliyê gişt̂î de bandoreke cidî him li ser gel û him jî li xebatê xizmetguzariyê ve kir.

`Bi alîkariya gelê herêmê me karî xebatê xwe ji sedî 70 pêk bînin`

Hevserokê Desteya Şeredariyê ya Kantona Efrîn û Şehbayê Mihemed Şêxo anî ziman ku di sala 2023'an rûxmî hemû astengiyan jî lê xebat di asteke serkeftî de hat meşandin û wiha got: "Herêm bi gişt̂î di nava êriş û siyaseta dorpêçê re derbas dibe. Em bixwazin nexwazin ev rewş li ser xebatên me bi awayekî neyînî bandor kir. Lê ya girîng ew bû ku em çawa li hemberî van siyasetan bisekinin û pilanên dijmin di her milî de têk bibin. XebatêN ku hatiNe meşandin û bi alîkariya gel serkeftina xwe ya li hemberî dijmin îsbat kir. di gişt̂î sala 2023'an de em dikarin bêjin ji sedî 70 xebatên şeredariyê rûxmî êrişên dagirkeriya Tirkiyê û dorpêça Hikumeta Şamê hat meşandin. Ev jî weke gavên serkeftî tên dîtin. Hêvî û pêşbînîyên me yên ji sala bê re, ew e ku em bikaribin bi vê bexwedaniya gel daxwaz û hêviyên gel bi awayekî serkeftî pêk bînin".

Navendên tenduristiyê jî ji êrişên dagirkeriyê bê par neman

Ronahî Sadûn/Qamişlo

Rêveberê Navenda Şûştina Gurçikan (Diyalîzim) û Kargeha Oksîjenê Rafi Ebas diyar kir ku ji ber êrişa dewleta Tirk a dagirker navenda Diyalîzim û kargeha Okisjînê bi temamî ji kar derketin.

Li Kantona Cizîrê 2 navendên diyalîzê hene, yek ji wan li taxa Alaya ya girêdayî bajarê Qamişloyê ye. Ev navend di sala 2021`an de hatiye avakirin. 6 alavên diyalîzê li navendê hebûn û 24 xebatkarên tenduristiye tê de dixebitîn. 70 nexweşên domdar li vir tedawî didîtin. Lê navend di encama êrişên dewleta Tirk ya 25`ê Berfanbarê de ev navend bi temamî ji xizmetê derketiy e. Kargeha Oksîjenê jî di hewşa Navenda Diyalîzê de ye. Beriya dû mehan hatibû avakirin û li Kantona Cizîrê tekane Kargeha oksîjênê bû. Ji bo hemû nexweşxane û navendên tendûristiyê tupên oksîjênê tije û belav dikirin. 8 xebatkarên tendûristiyê yên vê Kargehê ku rojê 250 tupên oksijênê tije dikirin. Di hedefgirtina dewleta Tirk de ev Kargeh jî bi temamî hilweşiya.
Di derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser Kargeha Hilbirîna Oksîjenê û navenda Diyalîzmê Rêveberê wê Rafi Ebas ji rojnameya me re axivî.
Rafi Ebas diyar kir ku di êvara 25`ê Berfanbarê de balfirên dewleta Tirk a dagirker bi hovane kargeha Oksîjenê ya di hewşa navenda Şûştina Gurçikan(Diyalîzim) deye kir hedef û wiha got: "Kargeha OKsjînê ya ku yekemîn kargeh di Kantona Cizîrê de bû, di encama êrişa dewleta Tirk a dagirker de, bi temamî hat hilweşandin. Ev kargeh oKsîjen belavî nexweşaneyên

Rêveberiya Xweser dikir, ew jî ji bo xizmeta civakê bû. Herwiha êrişa ku li kargeha OKsjînê pêk hat, zirareke mezin li navenda Şûştina Gurcikan(Diyalîzim), hem alavên wê û mehetên wê yên avê hemû helweşiyan. Di heman demê de navenda Diyalîzim jî ji kar hatiye rawestandin."

'Navenda Diyalîzimê xizmeta 70`ê nexweşî dikir'

Rêveberê Navenda Şûştina Gurçikan (Diyalîzim) û Navenda Oksîjenê Rafi Ebas axaftina xwe wiha qedandin: "Dewleta Tirk a hov, kargehên ku xizmeta civakê dikirin qebûl nekir, ji bo wê kirin hedef, armanca sereke jî ji van êrişan rawestandina jiyana gel di Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ye. Tenê ev Kargeha Oksîjenê û Navenda Şûştina Gurcikan (Diyalîzim) di Kantona Cizîrê de kar û xebat dikir, herwiha navenda Diyalîzim xizmeta 70`ê nexweşî dikir û dijmin ev yek jî qebûl nekir û bi sedema rawestandina navenda Gurçikan (Diyalîzim) nexweşekî gurçikan piştî çend rojan ji êrişê jiyana xwe ji dest da û wê gelek nexweş jiyan xwe ji dest bidin, ji ber tenê ev navend xelasiya wan bû, lê piştî rawestandina wê ji kar rewş wê pir xerab bibe. Dewletên navnetewî ji bû van êrişan hesab ji dewleta Tirk a dagirker nexwazin, wê dewleta Tirk a dagirker gef û êrişên xwe berdewam bikin û sûcên şer li ser gel me pêk bînin."

Abdullah Ocalan ji bo hemû pirsgirêkên civakê riya xelasiyê ye

Ji tevgera Gemeîrsam Kampfenê Rûa Fîtko, diyar kir ku paradîgmaya Abdullah Ocalan îlhamê dide wan û got ku " Abdullah Ocalan, jin di serî de ji bo hemû beşên civakî ji bo pirsgirêkên ku em dijîn, rêyeke xelasiyê nîşan dide."

Navenda nûçeyan

33 meh in agahî Ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nayê girtin ku 24 sal in li Girava Îmraliyê di bin şert û mercên giran ên tecrîdê de ye. Abdullah Ocalanê ku mafên wî yên hevdîtinê ji destê wî hatiye standin û bi rewşa bêragihandinê ya mûtleq re rûbirû dimîne. 10'ê Cotmehê ji bo azadiya fîzikî ya Abdullah Ocalan bi daxuyaniyeke hevpar li 74 navendên cîhanê pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî" hate destpêkirin.
Piştgiriya ji bo vê pêngavê ji beşên civakî yên cuda yên cîhanê berdewam dike. Dema ku qeyranên Modernîteya Kapîtalîst roj bi roj mezin dibin, beşên civakî yên li ser paradîgmaya Abdullah Ocalan weke rêya derketina ji van qeyranan gav bi gav mezin dibin. Abdullah Ocalan û fikrên wî ji bo kesên di qadên cuda de têdikoşin çavkaniya îlhamê ye. Endama Tevgera Gemeîrsam Kampfenê ya li Elmanyayê, Rûa Fîtko têkildarî pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî " û girîngiya paradîgmaya Abdullah Ocalan nirxandinên pir giring kirin.

'Abdullah Ocalan ji bo qeyrana cîhanê çareseriyê pêşkêş dike'

Rua Fîtko diyar kir ku paradîgmaya Konfederalîzma Demokratîk a Abdullah Ocalan ji bo fêmkirina krîzên li cîhanê û sedemên wan girîng e û got, "Tevî ku paradîgmaya Abdullah Ocalan li Rojhilata Navîn û Mezra Botan pêşketibe jî, ev paradîgma ne tenê bi pirsgirêkên li Rojhilata Navîn û Kurdistanê re têkîldar e, lê ji bo qeyrana ku cîhan tê de ye jî çareseriyê pêşkêş dike. Mînak ev paradîgma ji bo welatê min Elmanya jî çareserî û perspektîfekê pêşkêş dike. Di heman demê de rêyek alternatîf ji krîzên ku ji hêla gelên Elmanyayê ve tê jiyîn pêşkêş dike."
Fîtko got ku, "Paradîgmaya Ocalan di heman demê de rê dide me ku em xwe weke kesayet fam bikin" û wiha domand: "Bi saya fikrên Abdullah Ocalan em dikarin xwe ji nû ve pênase bikin. Ew Rêberekî girîng e."

'Divê em bi hev re têbikoşin'

Rua Fitko destnîşan kir ku Abdullah Ocalan li hemberî pergalên serdest alternatîfeke girîng pêşkêşî civakan dike û got, "Em tenê nikarin bi îdeolojiyên netew-dewlet ên îro serdest in ve girêdayî bin. Ya rast rêyeke duyemîn jî heye, Abdullah Ocalan di pirtûkên xwe de behsa vê rêya duyemîn dike. Bi gotineke din, rêyekê dide me ku civakên xwedî nirxên demokratîk dikarin bijîn. Abdullah Ocalan pêşkeş dike ku pergaleke bêdewlet, bêdesthilatdar çawa dikare bê avakirin. Paradîgmayên Abdullah Ocalan ne tenê rêbazek ji bo têgihiştina rastiya pergalên ku em tê de dijîn, di heman demê de ji bo ku di nava civakan de têkiliyek xurt were avêtin derfetek e. Abdullah Ocalan balê dikişîne ser girîngiya rêxistinbûna civakî ya li derveyî dewletê. Dewletên netewe her tim me bi nasname, zayendperestî, yanî cudahiyên me ji hev vediqetînin. Li hemberî van divê em hevpariyên xwe xurt bikin. Weke tevgerên li deverên cuda yên cîhanê, divê em têkiliyên di navbera xwe de xurt bikin û bi hev re têbikoşin."

'Abdullah Ocalan ji bo jinan perspektîfên girîng derdixe holê'

Rua Fîtko bal kişand ser girîngiya fikrên Abdullah Ocalan ên ji bo Têkoşîna Azadiyê ya Jinan û got, "Li gorî min tişta ku nêrînên Abdullah Ocalan ji bo tevgerên jinan girîng dike ew e ku ne tenê pêşniyaran dike, di pratîkê de jî bersivê dibîne. Abdullah Ocalan tenê nabêje divê jin xwe birêxistin bike, bi qasî ku ez ji Abdullah Ocalan fêm dikim hewl dide jinan fêm bike û çawa ku jinan fêm dike daxwazên jinan şênber dibe. Ew pêdiviyên jinan baş dibîne û di vê xalê de li ser rêxistina wan perspektîfên girîng pêşkêş dike. Em van tiştan li deverên cuda yên cîhanê nabînin. Di vê wateyê de paradîgmayên Abdullah Ocalan ji bo jinan xwedî cihekî pir taybet e. Di salên dawî de têkoşîna jinan li cîhanê gelekî zêde bûye. Lê di heman demê de bihêzbûna pergalên faşîst û baviksalarî jî heye. Li aliyê din bi paradîgmayên Abdullah Ocalan em dikarin li hember her cure polîtîkayên li dijî jinê tê pêşxistin bibin bersiv."

'Dema ku paradîgma tê fêhmkirin daxwaza azadiya ji bo Abdullah Ocalan mezin dibe'

Rua Fîtko jî destnîşan kir ku şert û mercên giran ên tecrîda li ser Abdullah Ocalan ji bo wan nayên qebûlkirin û destnîşan kir ku pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, Ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî " divê ji aliyê hemû beşên civakî ve bê qebûlkirin. Rua Fîtko got, "Ev pêngava ji bo azadiya Ocalan ne tenê bi pêşniyara tevgera Kurd destpê kir. Ev pêngav di encama têkiliyên dawî yên ku bi beşên cuda yên civakî re hatin avakirin û pêş ket. Ji ber ku van beşên cuda yên civakî Abdullah Ocalan fêm kirin, pêşniyar kirin ku ji bo azadiya Abdullah

Ocalan pêngav bê meşandin. Ev pêngav beriya her tişt̂î di encama bersivdayîna paradîgmaya Abdullah Ocalan a di nava gel de derket holê. Mirov çiqasî Abdullah Ocalan fêm bike, ewqasî hembêz dike û azadiya wî dixwaze. Min heta niha pêngavekî wiha mezin a azadiyê nebihîstiye. Divê ev kampanya heta ku encam bistîne hîn zêdetir were hembêzkirin û berfirehtir bibe."

'Dema ku Abdullah Ocalan azad nebe civak azad nabin'

Rua Fîtko bal kişand ser girîngiya azadiya Abdullah Ocalan a ji bo jinan û got, "Divê azadiya Abdullah Ocalan ji bo jinan xwedî girîngiyeke mezin be. Bi taybetî em jinên li Ewropayê divê baş bifikirin ka şert û mercên tecrîda li ser Abdullah Ocalan ji bo me tê çi wateyê. Divê em qebûl nekin ku ramangerekî girîng ê azadiya jinê di girtîgehê de ye. Azadiya Abdullah Ocalan û azadiya jinan bi hev ve girêdayî ne. Heta ku Abdullah Ocalan azad nebe, civakên mexdûrên pergala ku em tê de dijîn nikarin azad bibin."

Bêlançoya operasyonên li dijî şaneyên DAIŞ'ê û bazirganên madeyên hişbir

Navenda Nûçeyan/ Qamişlo

Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bîlançoya operasyonên xwe yên li dijî şaneyên DAIŞ'ê, istîxbarata Tirkiye, komên girêdayî hikumeta Şamê û bazirgan û karhênerên madeyên hişbir eşkere kir.

Bîlançoya operasyonên li dijî şaneyên DAIŞ'ê

Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bîlançoya operasyonên xwe yên li dijî şaneyên DAIŞ'ê, istîxbarata Tirkiye û komên girêdayî hikumeta Şamê aşkera kir.

Hêzên Ewlekariya Hundirîn 92 şane bêbandor kirine

Li gor daxuyaniya ku li ser malpera xwe parve kiriye, hêzan da zanîn ku di 2023'yan de wan 92 şane ji hev xistine, jê 19 şane yên istîxbarata dewleta Tirk a dagirker, 43 ên çeteyên DAIŞ'ê, 14 ên komên girêdayî hikumeta Şamê û 4 şaneyên çeteyên Artêşa Wetenî ya Sûriyeyê ne. Her wiha 289 kes girtin, 121 madeyên teqemeniyê hatin betalkirin. Ji wan 49 li kantona Cizîrê, 30 li kantona Reqayê, 17 li kantona Dêrazorê, 18 li kantona Tebqayê, 2 li kantona Firatê û 5 li kantona Minbicê ne.

Têkoşîna li dijî madeyên hişbir

Navenda Ragihandinê ya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bîlançoya 2023'yan a têkoşîna li dijî madeyên hişbir weşand.
Li gorî bîlançoyê, Rêveberiya Gişt̂î ya Têkoşîna li dijî Madeyên Hişbir hezar û 946 dosyayên têkildarî madeyên hişbir vekirine, 3 hezar 300 kes (172 bazirgan, 2 hezar û 165 bikarhêner, 963 belavkarên madeyên hişbir) hatin girtin. Her wiha hate diyarkirin ku 74. 557 kîlogeram kirîstal, 415. 32 kîlogeram heşîş, 428 şitilên heşîş (gihayê hişbir), 159 çixareyên heşîş, 648. 582 hebên hişbir, mîlyon û 636 hezar û 401 hebên captagon, 7.742 kîlogeram eroîn, 160 gram kokaîn, 107 paketên heşîş, 684 gram qembez, 21.907 derziyên hişbir hatin desteserkiri Bi gişt̂î Hêzên Ewlekariya Hundirîn di sala 2023'yan de 3 hezar û 300 bazirgan, bikarhêner û belavkarên madeyên hişbir girtine.

71 roj in agahî ji Silêman Ehmed nayê girtin

Navenda Nûçeyan/ Qamişlo

Rojnamevan û edîtorê Rojnews'ê Silêman Ehmed ku ji aliyê PDK'ê ve hatibû revandin, ev 71 roj in agahî jê nayê girtin.



Rojnamevan û edîtorê beşa erebî yê Rojnewsê Silêman Ehmed di 1'ê cotmehê de ji bo serdanê çû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Ehmed, di 25'ê cotmehê de xwest bi ser deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Herêma Federe ya Kurdistanê bibe. Lê li vir ji hêla hêzên PDK'ê ve hate revandin û ev 71 roj in agahî jê nayê girtin.
Hefteyek piştî windabûna Ehmed, asayîşa PDK'ê ya Duhokê daxuyaniyek da û îdia kir ku "Silêman Ehmed rojnamevan nîne." Bi vê daxuyaniyê li xwe mikûr hat ku Ehmed ji hêla wan ve hatiye binçavkirin.
Parêzerê Ehmed, Nerîman Ehmed diyar kiribû ku tevî biryara dozgeriyê jî Asayîşa Dihokê nahêle ew bi miwekîlê xwe re hevdîtinê bikin. Ehmed, da zanîn ku hînbûne ku dosya di destê saziya îstîxbaratê Parastinê de ye.
Koma Parastina Silêman Ehmed ku ji hêla parêzeran ve hatiye avakirin jî da zanîn ku heta niha zêdetirî 10 serlêdan ji bo Ehmed kirine lê destûra hevdîtinê nehatiye dayîn. Di heman demê de rayedarên PDK'ê jî têkildarî Ehmed ti agahî parve nekirine.

Çarçoveya têgînî... Ziman û Şaristanî

Ji remanê Rêber Apo

Têgîna ziman têkiliya xwe xurt bi têgîna çandê re heye. Di çarçoveyeke teng de ziman bi awayekî bingehîn têgîna sereke ya qada çandê ye. Di çarçoveyeke teng de mirov dikare ziman weke çandê jî bide naskirin. Ziman daneheva civakî ya zêhniyet, exlaq, his û fikra estetîk e ku civakekê bi dest xistiye; ziman hebûna nasnameyî û zêhnî ya mane û hisê ya serwextbûyî ye, bûye xwediyê îfadeyê. Civaka xwe gihandibe ziman, bûye xwediyê sedema bi hêz a jiyanê. Asta pêşketinê ya ziman asta pêşketîbûna jiyanê ye. Civakekê zimanê xwe yê dayikê çiqasî pêşde biribe, ew tê wê maneyê ku asta xwe ya jiyanê jî pêşde dibe. Dîsa çiqasî zimanê xwe ji dest dabe û ketibe bin hegemonya zimanên din, ev jî tê wê maneyê, ewqasî hatiye mêtin, qirkirin û asîmîlekirin. Civakên xwediyê vê rastiyê jiyaneke wan a manedar a zêhniyet, exlaq û estetîkê nabe û eşkere ye ku heta ji holê rabin wê weke civakeke nexweş mehkûmê jiyaneke trajîk bimînin. Civakên mane, exlaq û estetîka xwe ji dest bidin, nirxên wan ên civakî jî bi tenê ji bo nirxên mêtinkaran dibin maddeya xam a bikaranînê. Weke encam mirov dikare bibêje; mînak ziman weke li cem Kurdan be, civakeke di vê rewşê de ji aliyê maddî ve wê heta dawiyê xizan bibe û bikeve rewşeke parçeparçebûyî ango gelekî eşkere ye ku ji aliyê mane, exlaq û estetîkê ve wê bi şaşî, xayîn û kirêt bijî û nikaribe ji vê rewşê xilas bibe.

3- Şaristanî

Têgîna şaristaniyê zêdetir têgîna çanda giştî ya civaka di qonaxa çîn, bajar û dewletê de pênase dike. Çînbûn, bajarbûn û dewletbûn kategoriyên bingehîn ên civaka şareza ne. Civaka li vir civaka çînbûyî, bajarbûyî û dewletbûyî ye. Pêşdeçûna berbiçav û dîrokî bi xwe re di nava civaka klan û qebîleyên wekhev de diyardeya çînbûnê, li ser civaka gund-cotkariyê bajarbûn û ji nava civaka hiyarerşîk jî dewletbûn pêk anî û ev diyarde şaristaniyê karekterîze dikin. Civaka şareza li têkiliya sîmbiyotîk a di çarçoveya xweza-civakê de zêdekirî, di nava xwezaya civakî de têkiliya hukimraniyê ye ku yekalî pêş dikeve û her diçe weke nakokiyeke dijwar xwe nîşan dide û berbiçav dibe. Di nava civakê de avahî, manedan, exlaq û hisên estetîk ên cuda pêş dixe. Şaristanî ji bo civakê bûyereke erênî yan jî neyênî ye, mijarek e ku gelekî nîqaş li ser tê kirin. Li gorî kesên dîrok bi çavên serwer û mêtinkaran ava kirine, şaristanî bûyereke mezin a dîrokî ye, û heta dîrok bi xwe ye. Lê li gorî kesên di bin mêtinkarî û zordestiyê de şaristanî felaketeke mezin e, û jidestdana utopya cennetê ye. Ya rast jî ev e. Civakek hûrûkûr xwediyê vê nakokiyê be, li gorî xwezaya civakî wê têde fikir, exlaq û hisên estetîkê cuda bibin. Pêkhatina cîhana mane û saziyên bi nakok û parçebûyî li gorî karektera şaristaniyê ye. Şer herî zêde vê rastiyê îfade dikin. Hebûna çalakiyên civakî yên mîna şer ku di wan de tinekirinên fizîkî gelekî hene, civakeke hûrûkûr hatiye parçekirin dikare îfade bikin. Parçebûna maneyê jî şerê îdeolojîk îfade dike û ev jî di civaka şareza de bi qasî şerê fizîkî şerekî bi bandor ê hegemonîk e. Civaka şareza aliyên xwe yên cuda yên bi nakok li hêlekê bi şerên îdeolojîk, fizîkî û saziyan nîşan dide, li hêla din jî xwe paşve nadin xwe weke yekparebûna hîmên têkûz ên avahî û maneyên serwer û domdar îfade dikin. Îddîa dikin ku civaka rastî ji wan pêk tê û civak bi vî awayî heye ango dibe heyî. Serdema şaristaniyê di nava xwe de çiqasî kirasên dem û dewranan, kirasên sazî û maneyan li xwe bike jî maneya wê ya bingehîn her weke xwe dimîne.

Di pêşdeçûna civaka şareza de diyardeyeke bingehîn a mirov çavdêriya wê dike ew e, civaka şareza di nava wê civakê de ku têde mezin dibe, wê bi mekanîzmayên mêtinkarî û zorê her diçe dadiqurtîne, dihelîne û bi vê diyardeyê ve girêdayî têkiliya ekolojîk-sîmbiyotîk a bi Xwezaya Yekemîn re bi awayekî ji hev bike hildiweşîne, wê ji xwe re bi tenê dike çavkanî, wê dimije û her diçe diqedîne. Di rewşeke wisa de mijareke rojane dikeve rojevê, ew jî ev pirsgirêk e, gelo civak wê bi nakokiyên hundirîn, yan jî bi nakokiyên ekolojîk ji hev belav bibe. Ya rast jî ew e, eger di şaristaniyê de veguherîneke bi kok û erênî çênebe, di hukimraniya herdu nakokiyan de Xwezayên Yekemîn û Duyemîn wê felaketên mezin bibînin û wê nikaribin ji vê xilas bibin. Dibêjin civak bêyî şaristanî nikarin bijîn, civakên şareza civakên dewlemend û bi hêz in. Nirxandinên bi vî rengî îdeolojîk in, û zêdetir paradîgmaya elîta yekdestdar a tehekumkar û mêtinkar nîşan dide. Asta çînbûn, bajarbûn û dewletbûn gihiştiyê, li gorî tevahiya derdorên zanistê yên bi bandor weke kansêr û pencêşêreke civakî (kansêr û pencesêra biyolojîk jî bi vê rastiyê re têkildar e) tê nirxandin. Li ser vê mijarê têra xwe nîşane hene. Çêkirina sîlehên nukleer, hilweşandina hawîrdorê, bêkariya ji ber sîstemê zêde dibe, civaka zêde dixwe, zêdebûna pirr a şêniyan, kansêra biyolojîk, nexweşiyên cinsî û qirkirinên zêde dibin hin ji van nîşaneyên sereke ne.

Ji lewra modernîteya şaristaniya demokratîk a ku wê şaristaniya heyî ya bi kansêr û bi nakok ji karektera wê ya tehekumkar û mêtinkar derxe û veguherîne, her diçe xwe weke alternatîf û rêya rizgariyê ferz dike. Ya rast ew e, divê mirov hilweşîna şaristaniya kevin weke hilweşîna tevahiya şaristaniyê nebîne, weke pêşxistin û serekebûna şaristaniya demokratîk binirxîne. Di vê rewşê de ya girîng ku divê mirov zanibe ew e, çandên civakî bêhtir mayînde ne, di wê hêzê de ne ku dikarin şaristaniyan veguherînin, hem dikarin şaristaniyan cuda bikin û veguherînin, hem jî ji wan tê şaristaniyan ji binî ve veguherînin. Eger di civakekê de şaristanî hilweşe, divê ev weke zirar û ziyanekê neyê dîtin, berevajî, eger ji aliyê manedan û avabûnê ve rê li pêşketina çandê vekiribe, mirov dikare vê hilweşînê heta dawiyê weke pêşketin û bûyereke erênî qebûl bike, hukim bide. Eger rê li ber veguherîna şaristaniyê vekiribe, mirov dikare vê pêşketin û bûyereke weke rizgariyeke temam û xwegihandina jiyaneke azad şîrove bike.

‘Armanca bingehîn a polîtîkayên koçberkirinê, bênasnamehiştina gelê Kurd e’

Hevseroka Goçîzder’ê Medya Alkan: Armanca sereke ya koçberkirinê; valakirina erdnîgariya Kurdistanê û bê îrade kirina gelê Kurd e.

Koçberiyên bi zorê yên salên 90’î li bajarên Kurdan bi şewitandina gundan re hatin kirin, îro jî weke rêbazeke asîmîlasyon û bênasnamekirinê weke dewama polîtîkaya dewletê tên bikaranîn. Li gorî daneyên Komeleya Şopandin û Lêkolîna Koçberiyê ya Mezopotamyayê, hat ragihandin ku bi tenê di 9 mehên destpêkê yên sala 2023’yan de hejmara serlêdanên penaberiyê yên li Ewropayê ku di sala 2016’an de 9 hezar 675 bû, derket 51 hezar 415 kesî. Dîsa di raporê de hat destnîşan kirin ku bi gişt 6 hezar kes her meh koçî Ewropayê kirine û serlêdana penaberiyê kirine û ji sedî 80’ê vê hejmarê ji Kurdan pêk tê.

Hevseroka Komeleya Şopandina Koçberiyê (Goçîzder) Medya Alkan li ser polîtîkayên koçberkirinê yên li Herêma Kurdistanê tên meşandin ji ANF’ê re nirxand û got: “Sedema bingehîn a koçberiya ji bajarên Kurdistanê, di rastiyê de polîtîkaya şerê taybet a dewletê ye. Kesên ku ji ber qeyûm, zext, polîtîkayên siyasî û

aborî yên dewletê ve tên meşandin nikarin qadeke jiyanê peyda bikin, rêya dawî serî li koçberiyê didin e. Bi taybetî malbat ji vê rewşê gelekî ditengijin, malbat tên cem me û dibêjin, ‘ciwanên me diçin, çareseriyekê ji vê re bibînin’. Bi taybetî di dema piştî hilbijartinê de rewşeke cidî ya koçberiyê çêbû. Hejmara ciwanên ku koçber bûne ji ber ku bi rastî jî êdî çareseriyê peyda nakin û dizanin ku rêjîm naguhere gelek zêde bûn.”

Koçberî encama polîtîkayên şerê taybet e

Alkan, da xuyakirin ku divê rêxistinên sivîl têkildarî koçberiyên li bajarên Kurdan polîtîkayên nû hilberînin û pêşî li koçberiyê bigirin û wiha domand: “Bi peydakirina qadên jiyanê yên nû ji bo ciwanên me, em dikarin pêşî li koçberiyê bigirin. Em bi pirsgirêkeke koçberiyê ku piraniya wê ciwanin re rû bi rû ne. Ev rewş nîşanî me dide ku ji ber ciwan ji desthilatdariya heyî nerazîne, neçar mane derkevin dervî welat. Gelek ciwan hene ku wê rêveberiyê qebûl nakin û rast nabînin. Ev pêvajoya ku em niha dijîn, berdewama polîtîkayên koçberkirinê yên salên 90’î ne. Armanca sereke ya koçberiyan; valakirina erdnîgariya Kurdistanê û bê îrade kirina gelê Kurd e. Ev rewşa ku em dijîn, encama polîtîkayên şerê taybet e.”

Divê qadên jiyanê yên nû bên avakirin

Alkan, anî ziman ku koçberî parçeyek ji polîtîkayên asîmîlasyonê ye û got, “Desthilatdarî dixwaze gelê Kurd bê nasname bike, xaka Kurdistanê bê mirov bike û polîtîkayên ku dixwaze bimeşîne. Dixwazin vîna gelê Kurd bişkînin û van xakan vala bikin. Divê em warên xwe vala nekin, berovajiya wê em biparêzin. Divê em bûdceya xwe bi xwe çêbikin û bi dabînkirina qadeke jiyanê pêşî li koçberiya ciwanên xwe bigirin. Em wek komele çavdêriya koçberiyên li Kurdistanê dikin û lêkolînan dikin. Qeyûm û zextên dewletê di vî warî de me asteng dikin. Têkildarî koçberiyên ku piştî desteserkirina şaredariyan pêk hatin, komîsyoneke koçberiyê bê avakirin, ji bo pêşî li koçberiyê bê girtin, qadên werzîşê yên ciwanan bên berfirehkirin, qadên aborî yên ciwanan bên çêkirin. Dema ku ev şert û merc pêk werin, ji bo pêşîgirtina li koçberiya ciwanan wê gavên girîng bên avêtin.”

Em bi hev re axa xwe şîn bikin

Alkan, destnîşan kir ku li herêmên Serhad û Amedê koçberiyek cidî ya ber bi Ewropayê ve heye û wiha dawî li gotina xwe anî: “Li vê herêmê şebekeyek cidî heye. Ya rast karê me ew e ku em vê şebekê bibînin û çawa dixebitin derxin holê. Di lêkolînên xwe de me dît bi tenê di 9 mehên destpêkê yên sala 2023’yan de hejmara serlêdanên penaberiyê yên li Ewropayê ku di sala 2016’an de 9 hezar 675 bû, derket 51 hezar 415 kesî. Ji sedî 80’ê van serlêdanan ji ciwanên Kurd pêk tê. Em ji bo vê axê têdikoşin. Werin em bi hev re xwedî li axa xwe derkevin û dest ji axa xwe bernedin. Werin em bi hev re axa xwe şîn bikin.”

Revandina silêman razîkirina dewleta Tirk e

Dilyar Cizîrî

Rojnamevan û Edîtorê Beşê Erebî yê Ajansa Roj news Silêman Ehmed ev zêdeyî 70’î roj in ji aliyê desthiladariya PDK’ê ve hatiye revandin. Tevî Komîteya Parastina Rojnamevanan (CPJ) û Rêxistina Nûçegihanên Sînornenas)(RSF) jî di nav de gelek sazî û dezgehên herêmî û navdewletî ji hikûmeta Başûrê Kurdistanê daxwaz kirin, Ehemed di zûtirîn dem de serbest were berdan û aqûbeta wî were zanîn. Wan saziyan hikûmeta Başûrê Kurdistanê bi binpêkirina zagonên navdewletî û zagonên mirovî tewambar kirin. Lê rayedarên PDK’ê xwe wekî ne bihîstî û ne dîtî dike û hîn jî mafê xweparastinê ya li gorî qanûnê Iraq û Başûrê Kurdistanê jî nade Silêman Ehmed, rê nayê dayîn ne parêzer û ne jî malbat serdana Silêman bikin. Bi vê jî PDK’ê hemû exlaq û qanûnên mirovahiyê derbas dike. Li vir ez wekî hevalekî Silêman ê nêz ku me di Efrînê de bi hev re kar kiriye, ji rayedarên PDK’ê pirs dikim, Silêman çi sûcên derveyî qanûnî li Başûrê Kurdistanê pêk aniye?. Mane Silêman piştî dagirkirina Efrînê li Başûrê Kurdistanê bi awayekî fermî li Başûrê Kurdistanê jiyan dike. Niha çi hatiye bîra we hûn wî bi tewana û îdayên ne di cih de wî bin çav bikin?. Ya din jî ev çi sîsteme rê nede parêzer û malbatan serdana girtiyên xwe bikin? Heger hûn rast dî bûyera revandina Silêman de bi heq in, bersiva parêzer û malbatê bidin û bêjin me Silêman ji ber van sûcan girtiye. Di Kurdistanê de tu carî endametiya PKK’ê ne bû ye sûc, berûvajî heger tu ji xelkên Şengal û Kerkûkê pirs bikî, ew ê bi pisporî cûdahiya di navbera PDK û PKK’ê de bîne ziman. Ew ê yekser bêjin hemû cihên çekdarên PDK’ê xelkên wê bi mirinê re rû bi rû hiştin, gêrîlayên PKK’ê bi fedekariyek mezin ji wan şer kirin û canê xwe feda kirin. Lê xweş diyar dibe, revandina Silêman bi 2 armancan pêkhatiye ya yekem û herî kampax razîkirina dewleta Tirk û istxbaratên wan e, ya duyemîn jî tirsandina xebatkarên Roj news û astengkirina xebatên wê ye. Ji ber Roj news yekem saziya Başûrê Kurdistanê ya nûnertiya xeta ragihandina Azad dike. Bi nûçe û raporên xwe rastiya rayedaran û gendeliya bi destê wan tê kirin bi raya gişt ya Başûrê Kurdistan û tevahî Kurdistanê aşkere dike. Bi astengkirina Roj news hêvî dikin ku dê hemû xebatên ragihandina azad bê bandor bikin. Lê em xebatkarên ragihandina azad ji rayedarên PDK’ê yên çarenûsa Silêman Ehemed di destê wan de ye, re dibêjim bela ji xizmeta dewleta Tirk vegerin û tenê daxuyaniyên wa yên dema refiranduma Kerkûkê ya sala 2017’an bi bîra xwe ve bînin. Di heman demê de bela rewşa herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên dagirkirî li ber çavên xwe bibînin. Mane Silêman Ehmed ji Efrîna dagirkirî hate koçber kirin. Mane çeteyên dewleta Tirk di mala Silêman û bi sedhezaran malbatên Efrîn û Serêkaniyê yên dagirkirî hatine bi cihkirin. Ev rastiya dewleta Tirk lazime PDK’ê bi hemû rayedarên xwe ji xizmeta dewleta Tirk derkevin, rastî jî eve, heger dernekeve wê dîrok bi temamî wan ji nava xwe bavêje.

‘Hevpeymana Civakî îrade û nêrînên gel îfade dike’

Hevpeymana Civakî ku ji 134 madeyan pêk tê, di 12’ê Berfanbara 2023’an de ji aliyê Rêveberiya Xweser a Herêma bakur û rojhilatê Sûriyê ve hat erêkirin. Endamê Meclisa Giştî ya PYD’ê Mihemed Emîn Elîko diyar kir armanca Hevpeymana Civakî rêxistinkirina civakê ye.

Ayşa Silêman/ Qamişlo

Di 12’ê Berfanbara 2023’an de, Rêveberiya Xweser a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hevpeymana Civakî ku ji 134 madeyan pêk tê erê kir. Ragihandina hevpeymana civakî di qonaxeke wiqasç girîng de serkeftineke ji bo gelên herêma bakur û rojhilatê Sûriyê bû. Ji ber pêwîsteke mezin bi hepeymaneke wiha hebû.

Di derbarê girîngiya Hevpeymana Civakî de Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk Mihemed Emîn Elîko ji rojnameya me re axivî.

Mihemed Emîn Elîko diyar kir ku Hevpeymana Civakî yek ji destkeftiyên şoreşa Rojava bû û wiha got: “Erêkirina Hevpeymana Civakî berdewamiya berxwedana gelên me ye. Gelê me ku rastî êrişên domdar tê. Ev hevpeymana civakî ji bo pêşerojeke baştir ji bo welat me ye, di heman çarçoveyê de gelên me û hemû saziyên bakur û rojhilatên Sûriyê ji bo avakirina leşkerî û li hember kêşeyên pêşerojê, dest bi kampaniyên hişyarkirina hemû beşên civakê bikin, ev hevpeymana ji bo tevahiya Sûriyê jî dibe riya çareseriyî.”

‘Ramana Rêber Abdullah Ocalan ji bo krîzên Rojhilata Navîn çareseriye’

Elîko di dewamiya axaftina xwe de wiha got: “Şoreşa 19’ê Tîrmeha 2012’an ku ji Kobanê hat destpêkirin li tevahiya Rojava belav bû û li tevahiya cîhanê deng veda. Ev şoreş li ser bingeha felsefeya Rêber Abdullah Ocalan e. Ramanê Rêber Abdullah Ocalan ji bo krîzên Rojhilata Navîn cihê çareseriyê ye. Herwiha felsefeya neteweya demokratîk, biratiya gelan û jiyana hevbeş a di navbera hemû pêkhateyên civakê de dihewîne. Îro serkeftinên mezin ên ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê di hemû astên siyasî, aborî, civakî, çandî û leşkerî de bi dest xistiye û di navda hevpeymana civakî jî, tev bi saya fikr û felsefeya Rêber Apo ye. Hêjayî bibîrxistinê ku dema mirov madeyên Hevpeymana Civakî dixwîne, di nav de nirx mirovahiyê, wekhevî, demokrasî, dadmendiya civakî, rûmet û azadiya gelan dibîne.”

Madeya 3’emîn ya Hevpeymana Civakî

Mihemed Emîn Elîko da zanîn ku Hevpeymana Civakî ya bakur û rojhilatê Sûriyê, nêrîn û armancên gel îfade dike û wiha got: “Madeya 3’emîn ya Hevpeymana Civakî e ya Rêveberiya Xweser A Demokratîk ya Herêma bakur û rjhilatê Sûriyê civaka axlaqî û siyasî û polîtîkî pêş dixe û xurt dike, li hember modernîteya kapîtalîst , rêgezên modernîtiya demokratîk bi cih tîne, ev yek îradeya civakê, nêrînên civakê çfade dike, herwiha di milê birêvebirin, ku ew bi xwe karîbin dîroka xwe binvîsê, civak esas tê girtin, êdî tu kes nikare desthilatdariya xwe li ser vê civakê bike, heger em li derdorê dinêrin, em dibînin ku çawa rasmaliyetê bi xwe re şer, talankirin û wêran kirin aniye, lewma civak hatiye qirkirin, ji ber vê yekê madeya 3’yem tekez dike ku civakeke axlaqî û siyasî divê were avakirin li ser bingeha rast, wekhevî, demokratîk û karibe bibe bersiv ji vê rewşa ku em têde.”

Madeya 43’yan ya Hevpeymana Civakî

Derbarê madeya 43’yan ya Hevpeymana Civakî elîko wiha got: “Di madeya 43’an de hatiye eşkerekirna ku bidestxistina azadiya ramana siyasî ji bo hemû gel, pêkhate û takekesan û mafê wan e ku partiyên ku daxwazên wan temsîl dikin û avabikin, ev tê wateya ku herkes dikare nêrîn, helwest, bernameyên xwe yên siyasî, armancên xwe ji bo gelên xwe îfade bikin, lê di çarçoveyekî de ku dikare xwe hîn biparêze û armancên xwe yên sereke bidê xuyanîkirin, çi partî bin yan jî kesayet bin û her wiha armanca wan ya yekem xizmeta civakê be, ji ber vê yekê ev madeyeke bingehîne û girînge.”

Madeya 48’yan ya Hevpeymana Civakî

Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokrat Mihemed Emîn Elîko di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Peymana Civakî bi hemû madeyên xwe gel bingeh digre û wan diparêzin, madeya 48 ya ku mafê herkesî heye beşdarî siyaseta demokratîk bibe, li gorî qanûnê xwe hilbijêre, ev demên berê zehmet bûn, ji ber ku tenê hin kes hebû derbasî perleman dibûn bêyî ku gel wan nasbikin, li her derî ev yek dihat kirin, lê dema ku madeya 48 her kesî îfade dikê, û her kes azade dikare xwe li gor rêgezan xwe bibîne guncaw û xwe pêşînyar bike, ev yek encama têkoşîna vî gelî ye, ku rewşenbîrin, zanane, xwedan fikirin û karibin gelên xwe îfade bikin, avakirina civakeke exlaqî û siyasî, her wiha gavên mezintir werin avêtin di demên pêş de da ku nasnameya gelan îfade bike û dîrika xwe bi destê xwe binvîsin.”

‘Divê dawî li dagirkeriya Tirk were’

Nivîskarekî ji Misirê diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker li Bakur û Rojhiltê Sûriyeyê sûcan pêk tîne û der barê Xezayê de durûtiya siyasî dike. Nivîskarê misirî bang li Komkara Ereban û hikumeta Şamê jî kir ku dagirkeriya Tirk a li Sûriyeyê bi dawî bikin.

Têkildarî êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nivîskar û şîrovekarê siyasî yê ji Misirê Îbrahîm Şaban axivî. Îbrahîm Şaban diyar kir ku helwesta rejîma Tirk a li hemberî Xezayê û pêkanînên wê yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê durûtiya wê nîşan didin.

Şaban anî ziman ku dewleta Tirk li gel nebûna helwesta erebî û navneteweyî sûcan li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tîne û diyar kir ku ev yek siyaseta berjewndiyan nîşan dide.

Nivîskarê ji Misirê bêdengiya navneteweyî û erebî ya li hemberî pêkanînên dewleta Tirk a dagirker rexne kir û got: “Ji sala 2011’an û heta îro ve rejîma Tirk a bi serokatiya Erdogan sûcên şer pêk tîne. Di encamê de bi hezaran kes bûne qurbanî. Lê hêzên navneteweyî tev nagerin û hesab ji sûcdaran napirsin.”

Şaban îşaret pê kir ku dewleta Tirk serdestiya Bakur û Rojhilatê Sûriye û Iraqê binpê dike û wiha pê de çû: “Li gel Tirkiyeyê pirsgirêkên ewlehiyê li başûr welat hene. Ne mentiqî ye ku vê pirsgirkê bighîne Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û bakurê Iraqê. Dewleta Tirk serdestiya herdu welatan binpê dike û erdên wan dagirker kiriye. Nabe dewleteke li ser hesabê welatekî din ewlehiya xwe ava bike.”

Îbrahîm Şaban bal kişand ku helwestsa dewleta Tirk a têkildarî Xezayê gelek bazirganî û bikarnîna hasten Ereb û Misilman di nav xwe de hildigire û got: “Dem hatiye ku li hemberî sûcên Tirkiyeyê

yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tevgereke bê kirin. Berdewama bêdengiya li hemberî van sûcan êdî nabe.” Şaban bang li Komkara Ereban û hikumeta Şamê kir ku lîsteya sûcên dewleta amade bikin, bi awayekî fermî ji Enqere bixwazin bila ji xaka Sûriyeyê derve û dagirkeriya wî bi dawî bikin. Şaban hebûna dewleta Tirk a li Sûriyekî wekî “yek ji sedemên belavbûna terorê li Sûriyeyê” dît. Şaban da zanîn ku gelek delîl hene têkiliyên rejîma Tirk bi rêxistinên terorîst mina DAIŞ û Cebhet El Nusra re îsbat dikin.

Şaban bal kişand ku dewleta siyaseta durûtiya siyasî dimeşîne û destnîşan kir ku dewleta Tirk li aliyekî Îsraîlê ji ber şerê li Xezayê rexne dike û li aliyekê din sûcan li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike. Nivîskar Şaban Îbrahîm têkildarî êrişên vê dawiyê y ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî ev tişt anî ziman: “Di demekê de ku leşkerên Tirk hatin kuştin, afrînerê biryara Tirk gêj û îflas kiriye, tevlihev bûye, lew ra êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike.”

Şaban bang kir ku divê hesab ji Enqereyê were pirsîn û hêzên wê ji Sûriyeyê û Başûrê Kurdistanê werin derxistin.

Nivîskar û şîrovekarê siyasî yê ji Misirê Îbrahîm Şaban anî ziman ku dewleta Tirk a dagirker bi êrişên xwe yên li ser Sûriyeyê dê tu armancan bi dest nexe û got, îsbata vê yekê hebûna wê ya ji sala 2016’an ve li herêmê ku tu encam bi dest nexisetiye. **ANHA**

Bîranînek Sêvê Demîr

Farûk Sakik

Pêvajoya çareseriya pirsa Kurd a salên 2012-2015’an de hat bidawîkirin. Û ji nû ve polîtîkayên tundiyê yên ‘Plana Têkbirinê-Çokdanînê’ xistin meriyetê. Li ser vê yekê di sala 2015’an de Kurdan li Bakurê Kurdistanê rêveberiyên xweser îlankirin. Şer destê pê kir û piştî demekê jî dewletê qedexeyên derketina derve yên li bajaran îlan kir. Kurd bi barîkatan dixwestin pêşî li van êrişan bigirin. Dewleta Tirk a dagirker êrişî van barîkatan kir. Gelê herêmê di parastina cewherî de bû. Rojên dijwar bûn û hin kes jî ji derve li hewara wan dihatin.

Yek ji herêma derketina derve hatibû îlankirin Silopiya bû. Dema ku di 15’ê Kanûna 2015’an li navçeya Silopiya derketina kolanan hat qedexekirin, 3 jinên kurd, 3 şoreşger, Sêvê Demîr, Pakize Nayir û Fatma Uyar jî li hewara wan hatibûn.

Di 4’ê Çileya 2016’an de 3 jinên kurd, 3 şoreşger, Sêvê Demîr, Pakize Nayir û Fatma Uyar li navçeya Silopiya ya bajarê Şirnexê de hatin qetilkirin.

Dijmin ew wek hedef girtin û bi sûîqestê ew şehîd xistibûn.

Ji panzêrekî hatin gulebarankirin. Birîndar bûn lê nehiştin mudaxleya tibî were kirin û li aliyekê din şêwreê ji ber zêde xwîn ji wan çûbû, şehîd ketin.

Di rojên berxwedana xweser a Silopiya de Sêvê behsa bîranîneke xwe dikir. Digot:“Dema di nav barîkatên navçeya Silopiya de dimeşiyan, zarokek di destê wî de çek û nêzî Sêvê dibe. Ji Sêvê yek lîre dixwaze. Sêvê, dema ku di çentê xwe de li pere digere yek lîre nabîne. Bala wî çokaleteyek dikişîne û dixwaze bide vî zarokî. Lê ew çalakvan dibêje, ma qey ez zarok im ku tu çokalete didî min. Ez di barikatan de nobedê digirim. Dema Sêvê jê pirs dike, lê tu çima yek lîre dixwazî? Bersiva ez ê jî dukanê yek cigareyekî bistînim perê min tune.”

Mînakek 1 lîre ya din jî hebû; Sakip Sabanci dewlemendekî herî mezin ê Tirkiyê bû. Rojek di bernameyek tv de behsa bîranîneke xwe dikir. Digot: “Min rojek cuzdanê xwe wenda kir. Dema ku em lê digeriyan telefonek hat û got cuzdanê te li gel min e were bigire. Dema em çûn gel wî, me dît hertişt di cuzdan de weke xwe maye. Tu tiştek wenda nebûye. Destê nedabûnê. Min pere teklîf kir qebûl nekir û yek lîre ji min xwest. Min pirs kir, çima yek lîre? Got, min ev yek lîre deyin kir ku ez telefonî te bikim. Piştî vê diyalogê ev zarok girt cem xwe û di şirketên xwe de kar da wî. Piştî dem û salan ev zarok bû berpirsyarê şirketan.

Holdinga sabanciyan roj bi roj mezin bû. Roj hat me dît karê bazirganiya çekan dikin. Bi tucarê çekan ê navdar Adnan Kaşikçi re destê bi bazarganiya çekan kiriye.

Zarokê ku Sabancî nas kiribû û anîbû şirketa xwe, di bazirganiya çekan de berpirsyar bû. Çekên di encama vê bazarganiyê de bi destê diketin, dî kuştina kurdan de dihatin bikaranîn.

Zarokê ku Sêvê di barikatên Silopiya de nas kir jî mezin bû û ji bo ku ji şahidiya şahadeta 3 jinên şoreşger kiribû, bû gerîla. Li hemberî çekên holdinga Sabanciyan û ji bona ku mirovahiyê biparêze şer dikir.

Ew zarokê dilpak û paqij dî nav sîstema xwe de helandin. Ji kesayetiya wî ya roja ku ew cuzdan dît, dûr xistin.

Ew zarokê ku Sêvê di barîkatan de nas kir jî mezin bû û kesayeta xwe diha pêşve xist. Di nav tevgera azdiyê de bi ramanên Rêber Apo fêrî têkoşîna ji bo azadiya mirovahiyê bû.

Ji herdû zarokan yek bû çekfîroş yek jî bû azadîparêz.